Dewleta Tirk duh 25 'ê Kanûnê bi êrîşên hewayî ku heta derengiya şevê dom kir, li bakurrojhilatê Sûriyeyê dest bi êrîşeke mezin kir. Di êrîşan de herî kêm 8 kesan jiyana xwe ji dest dan, 15 kes jî birîndar bûn.
Hedefa sereke ya van êrîşan binesaziya bajêr bû. Li Kobanê kilÎnkek nexweşên derve a şekir ku ji aliyê komeleyeke Elman ve tê destekkirin, hat bombekirin û xerakirin. Şensî bû, klînîk ji bo betlaneya rojbûna Mesîh hatibû girtin û tu zerarên mirovî û birîndar nehatin ragihandin.
Ev navend bi giranî bi rêya klînîkeke gerok xizmeta extiyarên li bajar û gundên Kobanê dikir. Niha derfet a wergirtina heman xizmetan nîne. Bi şensî, ji ber betlaneya Noelê klînîk hate girtin û ti birîndar nehatin ragihandin.

Klînîka nexweşên derve a Şekir a li Kobanê, piştî êrîşa hewayî ya artêşa Tirk (Wêne ji aliyê komeleya, Elmanyî ve hatye kişandin)

Li Bajarê Qamişlo navendeke diyalîzên gurçikan ku mehane di navbera 650-700 nexweşên ku hewcedariya wan bi danişîna diyalîzê ya heftane heye, xizmetê dike û depoya oksîjenê ji bo peydakirina dermanan hate hedefgirtin.

Navenda diyalîza gurçkan li Qamişlo (wêne ji milê ofîsa ragihandina HSK ve hatye kişandin)

Hedefgirtina çapxaneya sereke ya pirtûkên xwendekaran li Bakur-Rojhilatê Sûriyê (Sîmav) ku di encamê de 6 xebatkarên wê yekser jiyana xwe ji dest dan. Ev çapxane li zêdetirî 4 hezar û 400 dibistanên herêmê pirtûkan li zêdetirî 800 hezar xwendekaran belav dike. Her wiha du kargehên hilberîna çîmentoyê, depoya embara a genim, kargeheke zeytê, aşê ard û Tehîniyê, kargeheke plastîk, kargeheke temîrkirina erebeyan û holeke şahiyan (şensî bû ku wê demê dawet çênedibû).
Ji ber hedefgirtina stasyonên ceyranê û petrolê ceyran ji bajarê Qamişlo, 9 bajarok û 2680 gundan qut dibe. Di nav de firne, navendên tenduristî û giştî.

Simav printing press in Qamishli city (Picture by KRC media office)

Tevî aramiya nisbî ya ku vê dawiyê di kirîza Sûriyê de li eniyên şer û koçberbûna navxweyî ya mezin hat dîtin, li bakurê Sûriyê rewş bi tevahî cûda ye. Nişтecihên wê ji ber bombebarana berdewam a Tirkiyê û firokeyên bêfirokevan li dijî sivîlan û binesaziya bingehîn: stasyonên elektrîkê, stasyonên petrolê, nanpêjxane, kargehên çîmentoyê, navendên tenduristiyê, û navendên perwerdehiya zarokan, rastî şert û mercên jiyanê yên dijwar tên. Êrîş û ziyan bi salan e berdewam in û ji Cotmeha 2022-an vir ve li dijî binesaziya sivîl pir zêde bûne. Ji bo sererastkirina van ziraran dê bi salan xebat û fonên mezin hewce bike.
Bakurê Rojhilatê Sûriyeyê ji bilî kêmbûna çavkaniyên enerjiyê yên weke gaz û sotemeniyê, ji xwe krîza giran a xwarinê dijî. Êrîşên dawî yên li dijî binesaziyê, wê trajediya însanî ya li Bakurrojhilatê Sûriyeyê zêde bike.
Tirsa daîmî ya êrîşên nû yên bi dronan, bandoreka kûr li ser tendiristîya derûnîya xelkê dike û bi taybetî jî zarokan.
Di mehên borî de êrîşên bêmirov ên berdewam , qutkirina avê wekî kiryareke şer li dijî milet , krîza kolerayê ya ku didome, berdewamkirina çalakiyên DAIŞ'ê û bi hezaran kesên koçber bûne nîşaneyên zelal ku em hê jî di rewşeke awarte re derbas dibin û herêm qet ne aram e. Bi salan e alÎkariya mirovî her tim kêm dibe û hewcehîyên mirovî bi çavkanîyên me yên sînordar gerek bên çareserkirin.

Rewşa niha ya kamp, nişтecihbûnên ne fermî, navendên binçavkirinê û girtîgehên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê: Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê niha bi deh hezaran li kamp û nişтecihgehên ne fermî li hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyê wan bicih dike . Ev kamp ji şerê li dijî Daişê, kesên ku di salên 2018 û 2019'an de ji êrîşên dagirkeriya Tirk reviyane, kesên ku ji şerê li Idlib an jî herêmên din ên başûrê Sûriyeyê reviyane û herî dawî jî kesên ku di dema erdhejê de malên xwe winda kirine, bicih dikin.
Rêjeya cîbicîkirinê û vegirtina kampên li bakurê Sûriyê gihîştiye karîna xwe ya herî dawî û di xizmetên bingehîn ên wekî xizmeta tendûristî, xwarin, perwerde û piştgiriya psîkolojîk de kêmbûnek mezin heye. Nemaze rewşa kampa El-Hol tê re derbas dibe. Kamp hê jî nêzîkî 60.000 kes dihewîne, piranîya wan malbatên Dewleta Îslamî ne û gelek ji wan ji welatên Ewropayê ne. Kamp ji xwe niha di nava nişтecihan de ji bo radîkalbûnê wek navenda xizmetê ye. Malbatên DAIŞ'î ji bo bibin leşkerên nû yên Dewleta Îslamî zarokên xwe mezin dikin . Beriya niha jî têra xwe hêza bersivdayîna vê rewşê tune bû û tunebûna alîkariya mirovî û rewşa nebaş a jiyanî radîkalbûna şêniyên kampê zêde dikir.
Êrîşkariya Tirk a niha, wê aloziya li nava kampê zêde bike û di hewldanên xwe yên ji bo bandorkirin û radîkalkirinê Dewleta Îslamî hêsan bike.

Girtîgeh û navendên binçavkirinê yên li bakurrojhilatê Sûriyeyê, ji hezaran DAÎŞ'î yên navneteweyî re mêvandariyê dikin. Şert û mercên binesazî û binyatanî gelekî nebaş in, pîvanên paqijiyê lawaz in û li gorî vê yekê gelek nexweşî li girtîgeh û navendên ragirtinê belav dibin. Kêmasiyeke girîng a cih heye. Şênî hê jî metirsîdar in û ti hêz ji bo sererastkirinê ji şêniyan re tune ye. Li zindanan jî DAÎŞ çalakiya xwe didomîne û her ku diçe xurttir dibe.
Ne aramiya tevahiya herêmê di encama şerê navxweyî yê 12 salan de, guhertina avhewayê, êrîşên dewletaTirk ên domdar ji salan ve û bi taybetî êrîşa mezin a niha dewam dike, şert û mercên pir baş diafirîne ku DAÎŞ ji nû ve xurt bibe. Radîkalbûyîn

wê zêde bibe, penaberî zêde bibe, pêwîstiya alikarê însanî zêde bibe, hejmara penaberên li jiyaneke ewle digerin wê zêde bibe.
Li gorî rêjeyên Xaça Sor ji sedî 90 'ê xelkê Suriyê di bin sînorê xizaniyê de dijîn. Li gorî Neteweyên Yekbûyî 16,7 milyon kes hewcedarî alîkariya mirovî ne li Sûriyê ku nêzî 6 milyon kes li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijîn. Tevî wê jî dewleta Tirkî aşên ard û firinên herêmê dike hedef û bi hezaran malbat ji nan mehrûm dibin.
Weke rêxistineke însanî ya herêmî û karkerên xwecihî yên ji sala 2012 'an û vir ve li herêmê dixebitin, em dikarin êşên sivîlan nas bikin û pê re bihest bibin. Gelek kesên ku ji Sûriyê û bi taybet bakurê Sûriyê koçber bûne, di serî de da ku jiyaneke ewle û başтir ji zarokên xwe re peyda bikin û karibin mîna her zarokekî li vê cîhanê bijîn.
Dewleta Turk hewl dide gel ji herêmê dûr bixîne da ku demografiya bakur û Rojhilatê Sûriyeyê biguherîne, mîna hewldanên xwe yên li herêmên din ên Kurdan mîna Efrînê ji Sibata 2018'an ve. Tevî rêûresm û qedexeyên dawî yên li ser rêyên koçberiyê yên ber bi Ewropayê ve ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve, êrîşên Tirkiyê yên li ser sivîlan û binesaziyê dê û bavan diajon ku birevin û xeteriyên ku zarokên xwe ji êrîşkariya Tirk rizgar bikin, tevî ku dizanin xeteriyên rêwiyên koçberiyê an jî derbasbûnên deryayê.
Rêya tekane ji bo kêmkirina beşek ji azarên sivîlan, bi rêya zexteke navdewletî da ku Tirkiyê ji hedefgirtina sivîlan, saziyên tenduristiyê û binesaziya din a ji bo rewşa jiyanî ya şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê raweste.

Heyva Sor a Kurd – Qamişlo
(Bi temambûna vê raporê re, di êvara 26 'ê Kanûnê de careke din topbarana giran a li qamişloyê ji nû ve destpê kiribû.)